

Navdarêن Cîhanê

LUDWIG VAN BEETHOVEN

1770 - 1827

Beethoven yek ji navdariñ 0 mezintirin danerên muzik 0 awazane di dîroka mirovatilye de.

Navê wî (Ludwig Van Beethoven) e. Li sala (1770) ê li bajêrê Bonn li Elmaniya di xani-yeke bê serûber ve-ku evro bûye muzexane-0 di nav xêzaneka hejar lê muzikdost de, ji dayik bûye. Li ser destê babê xwe dest bi muzikê kir e 0 fêrîjenîna arp, keman 0 piyanoyê bû.

Li sala 1787 ê seredana viyana kir ku hîngê paytexta muzikê bû li cîhanê 0 li wê derê Mozart nas kir ku bi mezintirin muzikvanen wî serdemî dîhate hejmartin.

Dema Mozart ì guh li muzika Beethoven ì bûy gote kesen li dewruberên xwe: "Hayê we ji vî hebe, rojek dê hêt hemû dinya dê behsa wî bike".

Beethoven bû şagirtê Mozartî 0 di vê şagirtiyê de behreya xwe gelek bi pêşve bir.

Pîşfî çend saleka ji Viyana dûr bûyî li sala (1792) ê dîsa vegeleyaye 0 Jîyana xwe ya mayî hemû li wê derê derbaz kir. Heyamekî bû qutabî li ber destê muzikvanê navdar Josef Haydnî 0 hîngê stêra wî wek awazdaner 0 piyanojen geş bû.



Her çend e beethoven muzikvanekê efsaneyî bû lê jiyaneka gelek sext 0 dijwar derbas kir.

Beethoven mirovekê nîgeran 0 hestnazik bû. Zô, zû digel hevalên xwe bi şerr diçû 0 zû, zû xaniyê xwe diguhumî 0 gelek cara ji jê nehatî ye kirêya xaniyê xwe bide. Mixabin delîva Beethovenî di viyana ji de baştir nebûye ji delîva wî di jiyanê de 0 heta mirî ji neyna.

Li temenê sîhsaliyê guhêne wî gelek giran bûn 0 paşî bi yekcarî kerr bû. Hîngê bi şêweyekê yekcarî xwe ji xelkî veder kir 0 hemô demê xwe da muzikê 0 di ser kermiya xwe re şîya baştirin şakarên xwe biafirine.

Beethoven li sala 1827ê çû ber dilovaniya xwedê. Lî muzika wi heta hetayê dê zindî bimîne.

Jî şakarên wî yên navdar:

Senfoniya germasiyê (ardika), senfoniya pêncê (qeder), senfoniya gundi (Pastoral), senfoniya heftê, senfoniya dengî (korâl), konsertta sîzari ya piyanoyê, konsertta kemanê, sonata tavaheyvê 0 batititik, nivêj 0 upira vidlyo.

